


## Welatparêzî: Pîvana Siyasî û Çandî ya

Peyva welatparêzî ji Yûnaniya kevnar (patriṓtēs) û Latînî (patria) tê û di destpêkê de wateya "welatê bav û kalan" bû. Di seranserê dîrokê de, ew pêşketiye û bûye têgeha girêdanek erênî bi welatê xwe, çanda wê û nirxên wê re. Îro, welatparêzî bi gelemperî wekî evînek berpirsiyar ji bo welatê xwe tê fêmkirin û ji neteweperweriyê tê cudakirin.

Dom»R:9



## Çarenivîsa Kurdistanê li Çarxera Encamparêzî/ Navenda Pêvajoyê

Me gelek caran bihîstiye û xwendiye ka Kurd çi dixwazin. Serxwebûn an federalîzm an jî şêweyeke din a diyarîkirina çarenivîsa xwe. Ev gotara kurt ne hewl dide ku bersiva vê pirsê bide, belku hewl dide ku rê analîz bike û ronî bike ser rastiyên veşartî û xefikan û rêya her yek ji wan ên jorîn.Serxwebûn, federalîzm, xwerêveberî û mafê bikaranînê heta yek mafî jî, ango mafê perwerdehiya bi zimanê dayikê û hwd.

Dom» R:6

*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

*Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî*

*www.agirimedia.org Hejmar (512) 19-02-2026*



## Terora ramanê û kuştina nasnameyê

Li demsala Havîna xwînî ya sala 1357`an a Rojî li Kurdistanê bigire heta terorkirina Dr. Ebdulrehman Qasimlo û Dr. Sadiq Şerefkendî li dilê Ewropayê û tepeserkirina serhildana "Jin, Jiyan, Azadî", mirov dikare redkirina siyasetek yekane bibîne: "terora ramanê" li dijî civaka Kurd. Siyasetek ku, li şûna ku bersiva daxwazên siyasî û çandî bide, hewl daye ku raman û bîra dîrokî ya neteweyekê bi rêya darvekirinên girseyî, trorkirina serokên li dervey welat, tepeserkirina rojnamevanan û krîmînalîzekirina ziman û cil û bergên Kurdî bişkîne; hewldanek ku .......

Dom» R:5

# Qedera me hemiyan yêk e



Renge we gelaek caran hin ristik û gotinên ku bi mînak li ser zimanan in, guhdarî kiribin, weke tête gotin:

"Qedera me hemiyan yêk e" "Em hemî siwarê gemiyekê ne" "Em mehkûmin bi hevre bin" û gelek gotinên din ên bi wî rengî.

Xuya ye ku demekê ev gotinane têne bikaranîn ku hin kes yan girûp dixwazin û cehdê dikin ku xelk û girûpên din li gel xwe bêxin.

Lê ti caran wan kes û girûpan basê hindê nekirine ku, ger em gel hev bin dê çi bigîje yên din ku gel wan dikevin, gelo dê wekhev bin?

Dê xwediyê mafê wekhev bin, piştî evê ku ev girûpên ku banghêjiya pevrebûnê didan, dê yên din ji xwe bizanin û bibînin?

Bê guman we ristika "Em hemî siwarê gemiyekê ne" bihîstiye, lê gelo heta niha we zaniye bingeha vê gotinê ji çi ve ye?

Mînaka herî kevnar a vê gotinê ji berhema Eflaton bi navê Komar e.

Eflaton welat û dewletê bi gemî û desthilatdaran jî bi Naxuda û xedemê wê gemiyê dişibîne.

Ev li ser vê bawerê bû ger gemî bi xirab bête ajotin, dê hemî kesên nava gemiyê de sedemê bibînin. Ev hizir, bingeha felsefî a " li gemiyekê de bûnê" çê dike.

Li welatê Ewropayê jî li dema ku şerek diqewimî, bi sedan sal e, berdewam ristik û gotina "Qedera me hemiyan yêk e" hatiye bikaranîn.

**Li Îranê de jî gotina "em hemî gemiyekê de ne", weke " Yêkgirtîbûna netewî – Hembestegiyê Millî" û "Qedera me hemiyan yêk e" yan " Em hemî pevre ne" ji aliyê alîgirên Paşayetî û yan li gotinên Xumeynî de dihate bikaranîn.**

Lê pirsyar ewa ye ku gelo em li wê gemiyê de xwediyê mafê wek hevin? Gelo netewên Kurd û Belûç û Ereb û Turkimen û Azerî, digel netewa Fars wekhevin?

Gelo zimanê me, perwerdeya me, abûriya me, nasnameya me, çanda me.... li gel Farsan beraber e? Bê guman bersiv nexêr e

Wekhevî li ser bingeha wekheviya netewan e.

Ev esl û yasaya pejirandî a navnetewî ger bête înkarkirin û netewên ne fars wek Kurd tenê ji mafê xwe tenê peyva " Hevgirtina netewî- Hembestegiyê Millî" xwedî derkeve û bê desthilat be û nekare xwe hakimê xwe be û qedera xwe bidest ve bigre, û dîsan her yêk netewe, yêk çand, yêk millet, yêk ax û yêk ziman û yêk Ala, bibe pîvana vê hevgirtina netewan, cihê her mafekê bigre û dîsan zilm û helandin û tunekirin a wan netewan wekî derbasbûyî dê berdewam be.

Ku wisa be yan divê nihade qebûl bikin ku ger em siwarê wê gemiyê bin, çi digîje me, yan em carekî din ezmûnên derbasbûyî dubare nakin û li gel we siwarê wê gemiyê nabin ku hûn pê me bigehne armancên xwe.



## Hizba Dêmokrat daxuyaniyek li derheq çileya Şehîdên Befranbara îsal belav kir

Dom » R:3




## Zimanê Dayikê, Keleha Azadiyê: Ji Berxwedana Çandî heya Mafê Diyarkirina Çarenûsa Kurdistanê

Dom » R:7

# Peyama Hizba Dêmokrat bi hilkefta derbasbûna 47 sal ji serkevtina şoreşa 1357ê



**Xelkê xebatkarê Kurdistanê!**
**Gelên serhildayî yê Îranê!**
**Hevwelatiyên azadîxwaz!**

22ê Rêbendana îsalî 47 sal ji herîfîna rêjîma paşatî û hatineserkar a komara îslamiya Îranê re derbas dibe.

Encama şoreşa sala 1357 a Îranê, herifîna rêjîma Pehlewî û hatineserkar a rêjîmeke olî û îdeolojîk a bi navê komara îslamiya Îranê bû. Ev rêjîma her ji destpêka hatineserkara xwe ve da xuya ku digel piraniya wan armancên şoreşvan û azadîxwazên Îranê ku dehan sal bû bo vê yekê xebat dikirin, cuda û dijî wan e.

Netwên jêrdest ên Îranê, berî hemûyan netewa Kurd çavnihlr bûn ku bi nemana rêjîma paşatî, vekheviya netewî, sitem û cudatîdanîna zimanî, olî û kultûrî bi dawî dibe, lê bersiva komara îslamî dana fitwaya cîhadê û sepandina şer bi ser Kurdistanê û piştguhxistina her cure geşeyeke siyasî û aborî bû. Hizb, rêkxirav û kesayetiyên azadîxwaz hivîdar bûn ku herifîna rêjîma Pehlewî, dêmokrasî, azadiya çapemenî û bîrûrayan, azadiya avakirina hizb û rêkxiravan û tekoşîna siyasî bê meydanê û herwisa rewşeke baştir a aborî û civakî li Îranê de cihgîr be. Lê neku her ev hivî û çavnihêrî çê nebûn, belkû serdemek nû ji dîktatorî, sitem, cudatîdanîn û tepeserkirinê li Îranê de dest pêkir.

Dîktatoriya wilayeta feqîh li heyama 47 sal desthilatdariyê de eva ku bi serê Îran û xelkê Îranê aniye ti tiştek bilî sepandina kevneperestî û bêmafî, bêparkirina netewên din ên Îranê ji destpêkîtirîn mafên wan, girtin, îşkence, bidarvekirin û kuştina xelkê, berfirehkirina terorîzm û fitneyan li dever û cîhanê, anîna şer û kawilkarî, sepandina dorpêçên aborî, bilindbûna nirxan, nedarî û anîna xelayî û birîsîtî bi ser xelkê Îranê, gendeliya ecêb û hederdana serwet û heyî ya Îranê li pêxema bidestveanîna çeka navkî û teyarkirina girûpên terorîstî, têkdana jîngeh û jinavbirina çavkaniyên binerd, nehiştina zanist û nirxên modern li perwerde û navendên zanistî, derkeftina pisporan û neçarkirina çend milyon ji xelkê Îranê bi koçberî û awareyî û kuştina hivî bi jiyanê bi taybet li wan nivşan de ku li jêr sîbera vê rêjîmê de perwerde bûnî û gelek tiştên dinêye nerênî bûn.

Xelkê Îranê her li vê dehika dawiyê de bi berdewamî bi rêya mangirtinên berfireh û xwenîşandanên giştî yên car bi car mezintir, xwest û biryara xwe bo dawîanîn bi temenê vê rêjîmê, ragihandine û her li heyva Befranbara îsal de li sedan bajarên Îranê de mezintirîn xwenîşandan bi rê ve çon. Lê desthilatarên Îranê ku ji berdewambûn û berfirehtirbûna wan xwenîşandanên seranserî de tirsa herifîna rêjîmê kevtibû nav dilê wan, bi fermana Xamineyî yê dîktator, kuştara herî bê mînak a xelkê li dîroka Îran û deverê de tomar kir. Bi wî awayî li tepeserkirina bi xwîn a xwenîşandanan de canê dehan hezar kesî ji wan standin, birîndar kirin û binçav kirin.

Em niha li rewşekê de yada 47 saliya şoreşê bi bîr tînin ku rêjîma îslamî, zêdetir ji her demekê rewatiya siyasî û yasayî û xelkiya xwe ji dest daye. Ev rêjîma li navxweyê Îranê de tenê bi komkujî û birêxistina çemê xweînê, bi kuştina xwenîşanderan û neraziyên birîndarbûyî û binçavkiriyan li jêr îşkenceyan de bi pêkanîna milîtarîzekirina bajaran, karî temenê xwe bo heyamek kurt, dirêj bike.

Li vê rewşa dîrokî de ku xelkê Îranê biryara dawîanîn bi temenê dîktatoriya wilayeta feqîh dane, Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, yada 47 saleya şoreşa Rêbendana 57 bi derfet dizane ku vê yekê rabigehîne:

**1-** Nabe careke din, ceribandina şoreşa 1357 a Îranê dubare bibe û dîktatorek cihê dîktatorekî din bigre. Şaşiyek ku piraniya xelkê Îranê û rêkxiravên siyasî yên vê serdemê li encama bawerîpêkirin bi Xumêynî û derfet bo serkevtina wî û hevhizrên wî çêkirin, 47 sal e ku bi dana can û xweîna xortên xwe û kawilbûna welatê xwe, nirx û baca vê hindê didin.

Tawankariyeke cihê lêbihorînê nîne hekî carek din rê bê dan ku her kesayetiyek û îdeolojiyek tevaviyetxwaz, dest bi ser berhema dehan sal xebat û qurbanîdana xortên xebatkar û azadîxwazên netewên Îranê de bigre. Îrana paşerojê, dibe Îranek azad û dêmokratîk be, Îranek ku tê de çendîn netewî, zimanî, olî, Îrana ku vekheviya jin û mêr bi fermî nas bike û bi dûr ji hemû sitem, tepeserkirin û cudatîdanînan be.

**2-** Yek ji girîngtirîn erkê xelkê û rêkxiravên siyasî yên Îranê, lezgînîkirin li pêkanîna rêberatiyek bi kom ku li qonaxa derbasbûn ji rêjêmê de nûneratiya bi hêz û aliyên siyasî yên cur bi cur ên pêkhateya xelkê Îranê bike.

Ji vê dîtingehê ve em bi rijdbûn li ser diyalog û hevkarî heta gihîştin bi hevpeymaniyek Kurdistanê, bi erkê lezgîn ê xwe û Hizb û rêkxiravên din ên Rojhilatê Kurdistanê dizanin û bi micidî li ser dixebitin. Hevdem banghêjiya vê dikin ku rêkxirav, alî û kesayetiyên xebatkar û azadîxwazên Îranê, bi taybet rêkxistin û kesayetiyên ser bi netewên bindest ên Îranê bi têgihêîştin li hestiyarbûna rewşa niha dikin ku li dora bername û armanca hevpar, hev bigrin bo vê yekê bikarin hewcehiyên derbasbûn ji vê qonaxê bi lezgîmî amade bikin.

**3-** Piştî çendîn car tepeserkirina bi xwîn a serhildana xelkê neraziyên Îranê bi taybet kuştina çendîn hezar kesî ya xwenîşanderan li heyva Befranbara derbasbûyî, ev rastiya bi başî eyan e ku rast e guherînên bingehîn û herifîna rêjêmê her bi rêya xelkê bi xwe tê kirin, lê li vê pêxemê de piştevaniya navnetewî li şoreşa xelkê Îranê bo dawîanîn bi rêjîma dîktator û mirovkuje komra aîslam, wek hewcehiyek xwe dide nîşandan.

Li vê hilkevtê de bi rêz ve yada hevxebatiya hevpar û yekgirtîbûna pêkhateyên curbicur ên xelkê Îranê li pêvajoya şoreşa dijî dîktatoriya Pehlewî bi bîr tînin, herwisa li hember şehîdên 47 sal xebat û berxwedana bi dijî rêjîma komara îslamî li Kurdistan û Îranê de, bi taybet dehan hezar şehîdên vê dawiyê, bejna xwe ditevînin.

Bi hivya yekgirtîbûn û hevxebatiya hemû pêkhateyên xelkê Îranê, dawî bi temenê dîktatoriyê bînin û riha Şehîdên xwe bo gihîştin bi armancên wan, şa bikin.

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**Desteya Kargêrî**
**21ê Rêbendana 1404 a Rojî**

# Hizba Dêmokrat daxuyaniyek li derheq çileya Şehîdên Befranbara îsal belav kir

**Hizba Dêmokrat: Tenê bi guherîna vê rêjîmê dê hikûmeteke dêmokratîk û sikolar, ewlehî û aramî li Îranê de çê bibe.**




**(DAXUYANIYA HIZBA DÊMOKRAT LI DERHEQ ÇILEYA ŞEHÎDÊN BEFRANBARA ÎSAL)**

**XELKÊ XWEDÎ HELWÎST Ê KURDISTANÊ!**
**GELÊN BÊZARBÛYÎ YÊN ÎRANÊ!**
**KOM Û CIVAKÊN MIROVDOST!**

Çil roj bi ser tepeserkirina bêrehmane ya xelkê serhildayî li rojên 18 û 19ê Befranbarê derbas dibe ku ji aliyê rêjîma îslamiya Îranê ve hatiye kirin.

Em li demekê de yada wan şehîdên serhildêr bi bîr tînin ku hejmara şehîd û birîndaran û binçavkiriyan roj bi roj zêdetir dibe û bi sedema qutbûna înternetê û rewşa tevav ewlehî li Îranê, heta niha jî amarekek serast ku bê şik û guman ji dehan hezar kesî derbas bûye, li ber dest nîne.

Li vê navberê de serîhildan li bajarên Îlam, Kirmaşan û Melekşa yê û şehîdbûna dehan hevwelatiyên me li dever û bajarên din ên Îranê û piştre mangirtina serkevtiyaneya xelkê Rojhilatê Kurdistanê bi tenê berteknîşandanek nebû, belku nîşaneya têgihîştina siyasî, geşekirina seha netewî û xwedîderketin ji Kurdistaniyan ji vê beşa niştiman bû.

Ev bûyerane dane selimandin ku xelkê Kurdistanê, berhemhênerê rêkareke taybet ji berxwedan û xweragirî û berpaniya giştî ya Rojhilatê Kurdistanê, meydana xebat û yekîtiya tevgera neteweyî a Kurdistanê ye.

Aliyê sembolîk û siyasî a vê yekgirtinê, îşarekirinek bo "manîfesta hêz" li Rojhilatê Kurdistanê û hevdem nîşanderê hevxebatî û hevçarenivîsiya xelkê Kurdistanê ye.

Li demekê ku 40 roj ji komkujî û kuştina xortên bivêr ên netewa Kurd li Îlam, Melekşa û Kirmaşanê derbas dibe, em rêz li nav û yada wan Şehîdan digrin û soza xwe digel wan dubare dikin ku heta bidestveanîna armancên wan ên rizgarîxwazane li welatê me de û gihîştina xelkê Kurdistanê bi mafên netewî, emê doza pîroze wan bidimînin.

Rêjîma îslamiya Îranê bi dirêjahiya çend dehikên derbasbûyî û bi milîtarîzekirina Rojhilatê Kurdistanê, siyaseta sekinandina geşe û bi kêmînekirin û bi ewlehîkirinê girte bera xwe, hewl da Kurdistanê bike cografiyayek piştguhavêtî, dûrxistî û dûrragirtî û dûr ji nasname û nasname û nasnameya netewî rabigre.

Lewma tekezî û pêdekirî li berdewambûna me li ser herîfandina rêjîmê û guherîna binyata pêkhateyên desthilata vê ye.

Ji vê dîtingehê ve, piştevanîkirin li pirsa dêmokrasî û netewî li Îrana çendîn netewî de, hewlek bo şikandina wan dorpêç û rewşa ewlehî û tepeserkarane ye ku ji navendê ve bi hêcata "asayîşa niştimanî" bi ser netewên jêrdest de hatiye sepandin.

Raste ku xebat û xweragiriya netewên Îranê a ku nirxekî giran li vê rêkê de hatiye dan, bo rizgarbûn ji rêjîma îslamî her berdewam e, lê li kêlega vê berdewamiyê de piştevanîkirina civaka navnetewî bo xelkê serhildayî yê îranê hewcehiyeke girîng a dîrokî ye.

Zewtkirina mafên netewî û binpêkirina mafên netewî û binpêkirina kerameta tak û kom a netewan ji aliyê vê rêjîmê ve, hevdem digel berdewambûna vê rêjîmê li tepeserkirina bi xwîn û bikaranîna hemû şiyana xwe li vê derheqê de, rewş û pirsgirêkên aloz e ku tê de çarenivîsa dehan milyon mirivî bi barimte hatine girtin.

Lewma hewce ye ku civaka navnetewî zêdetitr vê rewşê berçav bigre û li asta çewsandin û tepeseriya netewî û tundûtijiya rêjîma Îranê û bikaranîna hêza tepeserkar li hember tevgera netewiya Rojhilatê Kurdistanê û netewên din, pitir bi seh bin û dibe helwîst hebin heta ji vî warî ve, nirxa giran û bi can û mal a xelkê serhildayî kêm bikin.

Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê pêdegirî li ser vê yekê dike ku bi tenê bi guherîna vê rêjîmê bo hikûmeteke dêmokratîk û sikolar û îtirafkirin bi îrade û mafên netewî û siyasî yên pêkhateyên netewî li ser cografiyaya Îranê ye ku ewlehî û aramî li wî welatî de dê çê bibe.

Careke din li çileya Şehîdên Befranbarê de em silavan bo canê paqijê wan şehîdan bi taybet welatiyên me yên Şehîdbûyî li Kirmaşan, Îlam, Melekşayê û deverên nişîv ên Kurdistanê dişînin.

**Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê**
**Desteya Kargêrî**
**15ê Şibata 2026**

# Roja Cîhanî ya Zimanê Dayîkê: Hêmaya Desthilatê yan çeperek ji bo berxwedanê?



N. Serbest Urmiye

**Bi bingehgirtina zimanê kurdî di bin desthilatdariya dagîrker de**

Roja Cîhanî ya Zimanê Dayîkê ku bi destpêşxeriya ``UNESCO``yê hatîye diyarîkirin, her sal dibe derfetek ji bo pîrozkirina pirrengiya ziman û çandên cîhanê.

Di nihêrîna yekem de, ev roj weke hêmayeke menewî tê mêzekirin ji bo rêzgirtin û nîşandana hêza zimanên cuda. Lê belê dema ku bas tê ser zimanê kurdî û di çarçoveya desthilata serdest û dagîrker de tê şîrove kirin, naveroka vê rojê ji mijareke sembolîk ve derbas dibe û dibe emraz yan çeperek ji bo berxwedana çandî û nasnamexwaziya neteweyî û siyasî.

**Ziman di pêgeha desthilateke sembolîk de**

Di teoriya sermaye û desthilata sembolîk de, "Pierre Bourdieu" hewil dide ku wê yekê bide pejirandin ku ziman yek ji alavên sereke yên berhemanîn û rewayî danê ye bi desthilata civakî.

Heçî gava ku zimanek bi fermî tê naskirin, ev tenê nîşana rêzgirtin li çand û nasnameya axavtikarên vî zimanî nîn e, belkû bizavek e ji piştevaniyê bo zindî man û naskirina vî zimanî.

Li gor vê baweriyê, Roja Cîhanî ya Zimanê Dayîkê hêmayek e ji bo nîşandana hêza zimanên cuda; bi taybetî ji bo zimanê kurdî ku di dirêjahiya dîroka xwe de di bin zexta qedexekirin û hemû cure siyasetên bişavtin û ji holêrairinê de bûye.

Meşrûiyeta navneteweî ya zimanê kurdî, heta di asta sembolîk de jî, wê rastiyê dide xuyakirin ku ev ziman xwedî hêzeke taybet û pêgeheke bihêz û bi bandor e ji bo hevrikiyê di qadên giştî de û veguhastina ezmûnên şaristanî û nîştimanî yên xwe .

**Ziman, çeper û emrazê berxwedanê**

Ziman qada hevrikiyê di navbera desthilat û berxwedanê de ye. "Michel Foucault" di wê baweriyê de bû ku desthilat tenê di sazî û rêkxistina de nahê temsîl kirin. Belkû di nava tevn û rişiyên têkiliyên civakî de xwe nîşan dide û ev têkiliyên civakî jî di her ast û qonaxekê de dikarin delîveya berxwedan û xwe parastinê biafirînin û bihêz bikin.
Parastin û bikaranîna zimanê dayîkê yê kurdî di warê perwerde, wêje, muzîk û di rojeva jiyanê de, mînakek e ji berxwedana jîrane û rojane ya gelê kurd li hember siyasetên tunekirin û serkutkirina çandî û neteweyî de.

Ev berxwedan, li gorî ya ku di teoriya dagîrkeriya ziman de hatîye, bertekek e li dijî bizavên wekhevkirin û yekdestkirina ziman û çandê ku hewil didin zimanê serdest bi ser zimanên dagîrkirî de bisepînin û bingehên dîrokî û çarçoveyên zanistî yên civaka dagîrkirî ji nav bibin.

Zimanê kurdî di vê qadê de, êdî tenê erkê axaftin û peywendiyê nagire, di asteke bilindtir de dibe hêma û hêzeke bibandor ji bo ji nû ve berhemhanîna nasnameya giştî, veguhastina ezmûn û berxwedana li dijî desthilata serkutkar. Her gava ku axaftin, nivîsîn û fêrbûn bi zimanê dayîkê bû rêrewa jiyana neteweyî, siyasî û civakî, vê gavê civak bi kiryar di çeperê berxwedan û xwe parastinê de ye, ku encamên wê yên siyasî û civakî xuyatir û berfirehtir in ji pîlanên tunekirinê yên hêza dagîrker.

**Bi hevre girêdayîbûna hêma û kiryaran**

Mirov dikare Roja Cîhanî ya Zimanê Dayîkê wekî pêvbajoyeke du cemserî ya bi hevregirêdana berdewam şîrove bike. wate Hêmaya desthilatê û emrazê berxwedanê.




Ev roj di hêla fermî de, daxuyaniya navneteweyî û rewatiya çandî ye li dor zimanan; lê di asta civakî û cemawerî de, fersendek e ji bo çalakkirina hizra dîrokî, perwerdehiya bi zimanê dayîkê û nûkirina daxwazên li dor mafên zimanî û çandî.
Bi taybetî di wan civakan de ku zimanê wan di bin zextê de ye yan hatîye qedexekirin, ev roj bêtirî ku bibe bîranînek di rojhejmêra salê de, derfetek e ji bo ragihandina pratîkî ya hebûnê û daxuyaniyek e ji berxwedanê.

**Bi kurtî**

Zimanê kurdî, di çarçoveya desthilata dagîrker de, mînakeke zindî e ku çawa zimanek dikare di heman demê de hem hêmaya desthilatê be û hem jî emraz û çeperek be ji bo berxwedanê.

Di dîtingeha sembolîk de Hêza ziman di meşrûiyet û nûnertiya ziman de ye û berxwedana zimanî jî di berewamîya bikaranîn, veguhastina ezmûn û zaniyariyan û her wiha berxwedana li hember siyasetên serkutker de xwe nîşan dide.

Roja Cîhanî ya Zimanê Dayîkê, nabe tenê weke roja rêzgirtin ji firerengiya zimanî û çandî were pênasekirin; belkû divê bibe platformek ji bo naskirina şûnasên firereng û bihêzkirina civakan ji bo parastina mafê axaftin û perwerdehiya bi zimanê dayîkê.

Zimanê kurdî ji gelê Kurd re tenê mîrateke çandî nîn e, qad û çeperek e ji bo fêrbûn û bihêzkirina hizra azadiyê û têkoşîna li dijî sîstem û siyasetên bişavtin û tunekirina çandî û neteweyî.
berxwedan û geşepêdana zimanê kurdî û sekinîna li dijî dagîrkeran, daxuyaniyek e ku dide selimandin ku ziman her çiqas jî di bin zextê de be, ji bandor û hêza berxwedanê vala nabe.



# «Terora ramanê û kuştina nasnameyê»



N. Hesen Mukerem

Li demsala Havîna xwînî ya sala 1357`an a Rojî li Kurdistanê bigire heta terorkirina Dr. Ebdulrehman Qasimlo û Dr. Sadiq Şerefkendî li dilê Ewropayê û tepeserkirina serhildana "Jin, Jiyan, Azadî", mirov dikare redkirina siyasetek yekane bibîne: "terora ramanê" li dijî civaka Kurd. Siyasetek ku, li şûna ku bersiva daxwazên siyasî û çandî bide, hewl daye ku raman û bîra dîrokî ya neteweyekê bi rêya darvekirinên girseyî, trorkirina serokên li dervey welat, tepeserkirina rojnamevanan û krîmînalîzekirina ziman û cil û bergên Kurdî bişkîne; hewldanek ku, tevî tundûtûjiya berfireh, hîn nebûye sedema bêdengkirina Kurdistanê.

**1 - Ji Fetwaya "Cîhada Li Dijî Kurdistanê" bigire heta Darvekirina Xwepêşanderên Kolanan**

Piştî serkeftina Şoreşa 1357`an a Rojî li Îranê, Kurdistan yek ji herêmên pêşîn bû ku daxwazên xwe ji dirûşmeyên giştî wêdetir bilind kir: xwerêveberiya demokratîk, bi fermî naskirina nasnameya neteweyî û misogerkirina mafên çandî û zimanî. Di bersiva van daxwazan de, rejîma Komara Îslamî ya nû damezrandî ne ji diyalogê, lê ji zimanê çekan mifah wergirt.

Bi daxuyaniya bilez ya Ayetula Xumeynî ku xwepêşandanên li Rojhilatê Kurdistanê bi"serhildan" binavkir, û hêzên Spaha Pasdaran a terorîst , artêş li bajar û gundên Kurdan bicihkirin. Li kêleka operasyonên leşkerî, dadgehên rejîmê di bin serokatiya dadwerên wekî Sadiq Xelxalî de li bajarên weke Sine, Seqiz, Mehabad û Bokanê hatin damezrandin; dadgehên ku darizandin carnan bi çend deqeyan pirs û bersivdanê bêyî hebûna parêzerek an derfeta berevanîkirin ji xwe sînordar bûn, û pir caran bi darvekirinê bi dawî dibûn.

Bi dehan çalakvanên siyasî, pêşmerge, mamoste, mela û heta gundiyên ku bi tenê "piştgiriya dijberiyê" dihatin tohmetbarkirin, di van darizandinên bêdadwerî de cezayê darvekirinê bo wan dihat birîn. Di gelek rewşan de, malbat ji cihên ragirtina mirovên xwe bêagahî diman û destûr nehat dayîn ku merasîmên şînê li dar bixin.

**2 - Terorkirina Serokên li dervey welat: Bêdengkirina Dengên Navneteweyî**

Terora hizr û ramana li dijî Kurdan ne tenê bi sînorên erdnîgarî yên Îranê ve sînordar bû, belku heta li dilê Ewropayê jî belav bû. Dr. Ebdulrehman Qasimlo, Sikirtêrê Giştî yê Hizba Demokrat a Kurdistana Îranê, yek ji kesayetiyên siyasî yên Kurd ên herî navdar bû ku planeke zelal ji bo çareseriyeke aştiyane ji bo pirsa neteweyî li Îranê pêşkêş kir.

Di 22 yê Tîrmeha 1368`an a Rojî de, Dr. Qasimlo li Viyanayê ji aliyê bi nav nûnerên rejîma Îslamî ve hat terorkirin ku li halê danûstandinên fermî de bû. 3 sal şûnda, di 26ê Xermanana 1371`an a Rojî de, Dr. Sadiq Şerefkendî, cîgirê şehîd Dr.Qasimlo, ligel sê hevalên xwe li Berlînê hate terorkirin. Di biryareke dîrokî de, Dadgeha Cezayê ya Alman ev teror wekî "terorîzma dewletê" bi nav kir û ragihand ku biryara terorkirin di asta herî bilind a rêveberiya Komara Îslamî de hatiye dayîn. Vê biryarê bi fermî cîhan bi rastiyekê re rû bi rû kir ku Kurd bi salan e qala wê dikirin: jiholêrakirina fizîkî ya rêberên siyasî beşek ji dezgeha fermî ya biryardanê li Tehranê ye.

Terorkirina Dr. Qasimlo û Dr.Şerefkendî ji perspektîfa kuştina rewşenbîrî ve xwedî du wateyan bû. Ji aliyekê ve, wê serokatiya karîzmatîk û jêhatî ya tevgera Kurd a li dervey welat kir armanc da ku civakê "bêserûber" û belavbûyî hîs bike. Ji aliyê din ve, ew peyamek bû ji bo hemî çalakvan û rewşenbîrên Kurd ên li derveyî welat: "Tu der ewle nîne; ne jî li ser maseya danûstandinan û ne jî li dilê Ewropayê." Ev peyamek bû ji bo sînordarkirina qada çalakiya dîplomatîk a tevgera Kurd li ser asta cîhanî.

**3. Şerê li dijî Medya û Zanîngehan: Tepeserkirina Kanalên Raman**

Li hundirê Îranê, amûrên sereke yên terora rewşenbîrî saziyên zagonê û ewlehiyê bûn; amûrên ku bi eşkereyî di bin navê "parastina ewlehiya dewletê" de dixebitin, lê di pratîkê de, ew torên hilberandin û veguhestina ramanan dikin armanc.

Yasaya Komara Îslamî bikaranîna zimanên herêmî qedexe nake, lê di çar dehsalên borî de, perwerdehiya fermî ya zimanê Kurdî li dibistan û zanîngehan an hatiye qedexekirin an jî bi awayeke sembolîk û kontrolkirî hatiye destûr kirin. Her hewldanek ji bo avakirina dibistanên duzimanî, vekirina dersên zimanê dayikê, an jî hilberandina naveroka perwerdehiyê ya Kurdî bi gumanên ewlehiyê û givaşa rêveberiyê re rû bi rû maye.

Zanîngeh jî ji vê siyasetê bêpar nemane. Di salên 1360`an de, di bin



navê "şoreşa çandî" de, gelek mamosteyên serbixwe, çalakvanên xwendekar û komeleyên çandî yên Kurdî hatin paqijkirin. Li şûna ku bibe cihek ji bo diyalog û jidayikbûna ramanê, zanîngeha li Kurdistanê bû cihek kontrolkirî ku tê de xêzên sor ên ewlehî û îdeolojîk diyar dikirin ka çi dikare were gotin û çi nayê gotin

Di warê medyayê de, di sê dehsalên dawî de bi dehan Rojnamevanên Kurd bi tohmetên weke "li dijî ewlehiya welat tevdigerîn", û "têkdana raya giştî" gelek caran hatine girtin û cezayên girtîgehê bi ser wan de hatine sepandin. Gelek ji wan bi bandor ji çalakiyên pîşeyî hatine qedexekirin an jî piştî serbestberdana xwe neçar mane ku cih û warê xwe biterikînin.

**4 - Terora nasnameyê di jiyana rojane de: ziman, cil û berg, sembol**

Terora rewşenbîrî ne tenê di asta elît û zanîngehê de çêdibe; ew di hûrgiliyên herî biçûk ên jiyana rojane ya gelê Kurd de jî heye. Zimanê dayikê, cilên gelêrî, muzîk û dawet hemî bûne qadên pevçûnê.

Li dibistanên li Rojhilatê Kurdistanê, bikaranîna Kurdî pir caran tenê ji bo çend merasîmên fermî û dersên sînorkirî tê tehmûlkirin. Ev givaşa çandî hêdî hêdî hesta şermê ji bo zimanê dayikê di hûndrê zarokên Kurdan û dabeşbûna nifşan xurt dike, ku ew tiştê ku siyasetmedarên terora rewşenbîrî lê digerin e.

Di salên dawî de, bersiva ewlehiyê ya li hember lixwekirina cilên zilaman ên Kurd, nemaze bi rengên taybetî yên weke rengê xakî, ku weke sembola berxwedanê tê şîrovekirin, dîtingehên nû ji xwe girtiye. Ciwanên ku beşdarî dawetan an pîrozbahiyên herêmî bûne, di hin rewşan de bi "sembolîzma siyasî" û "propagandaya li dijî rejîmê" hatine tohmetbarkirin û bi girtina wan an cezayên pereyan hatine cezakirin.

Dema ku lixwekirina cilên gelêrî, dawet bi şêwaza herêmî, an nîşandana nîşanek û sembolên çandî yên Kurdî ji hêla dezgehên ewlehiyê ve weke "gef" têne dîtin, xeta di navbera sûc û nasnameyê de nezelal dibe. Ev rewş dihêle ku welatiyê Kurd fêm bikin ku tewra xuyangên herî hêsan ên nasnameya wî/ê jî di destê desthilatdariyê de ne; rewşek ku bingeha terora rewşenbîrî û psîkolojîk pêk tîne.


**5. Serhildana "Jin, Jiyan, Azadî"**

Kuştina Jîna Emînî di Xermanana 1401an de, ku piştî ku ew ji hêla Hêza Geşta Îrşad ve hate girtin û li navendeke binçavkirinê hate lêdan, xala kelandina dehsalan a cudahî danîn û tepeserkirinê bû. Jîna keçek ciwan a Kurd xelkê Seqizê, bû sembola berxwedanê li dijî rejîma zordar, û dirûşmeya "Jin, Jiyan, Azadî", ku rehên wê kûr di wêje û ezmûna têkoşînê li Rojhilatê Kurdistanê de ye, bû dirûşmek protestoyên neteweyî. Bersiva hikûmetê gulebarankirina rasterast a xwepêşanderan, girtinên girseyî, îşkence û bêrêzîkirin li navendên binçavkirinê, sepandina cezayên darvekirinê bû.

Lê belê ji dîtingeha "Jin, Jiyan, Azadî" ji perspektîfa terora rewşenbîrî peyamek girîng hebû: ezmûn û dirûşmên ku ji Rojhilatê Kurdistanê derdikevin êdî bi sînorên vê erdnîgariyê ve sînordar nînin û bûne beşek ji çanda siyasî ya nifşa nû li seranserê Îranê. Ev tê vê wateyê ku siyaseta çar dehsalan a terora hizir û ramanê ne tenê nekariye nasname û berxwedana Kurdan ji holê rake, lê di dawiyê de ziman û ezmûna wan veguherandiye zimanek hevpar a protestoyê.

Lê dîsa jî, çar dehsal piştî gulebarnanên pêşîn li Sine û Mehabadê, ziman, çand û têkoşîna siyasî ya Kurdî hîn jî zindî ye û îro beşek yekgirtî ya gotara azadiyê li Îranê ye. Terora rewşenbîrî gelek can girtiye, lê hîn nekariye bîr û îradeya kolektîf a civaka Kurdî bitepisîne; û ev yeka şikesta herî mezin a rejîma Îranê ye.

# Çarenivîsa Kurdistanê li Çarxera Encamparêzî/Navenda Pêvajoyê



**N. Kawe Ahengerî**
**W. Hesen Mukerem**



Me gelek caran bihîstiye û xwendiye ka Kurd çi dixwazin. Serxwebûn an federalîzm an jî şêweyeke din a diyarîkirina çarenivîsa xwe.

Ev gotara kurt ne hewl dide ku bersiva vê pirsê bide, belku hewl dide ku rê analîz bike û ronî bike ser rastiyên veşartî û xefikan û rêya her yek ji wan ên jorîn.

Serxwebûn, federalîzm, xwerêveberî û mafê bikaranînê heta yek mafî jî, ango mafê perwerdehiya bi zimanê dayikê û hwd.

hemî “encam” in û ne pêvajo bi xwe ye. Ger neteweyek rê û pêvajoyek rast û bihêz ji bo gihîştina armancê hilnebijêrin, tiştê ku di dawiyê de dê feyde bide wan ev e.

Encam dê “tiştek” û têkçûnek kujîner be. Dibe ku pirsa rast were kirin: Ma divê armancek me tune be?

Bê guman, her kes û neteweyek şerker ne tenê ji bo mayîndebûnê, lê di heman demê de ji bo gavek ber bi pêş ve avêtinê jî hewceyê armancekê ye.

Lê pirsa ku li ser vê pirsê daliqandî ye, ev e ku mirov çawa bigihîje wê?

Kîjan stratejî û taktîk dê me ewqas bihêz bikin ku ew ê “me” bidin şiyana ku em vê rêyê bimeşin da ku bigihîjin wê armancê?

Ji sedî şansê ku kesek an neteweyek lawaz bigihîje armanca xwestî çi ye?

Bêyî amadekarî û şiyanê, gelo rê dikare bi rêkûpêk û heta dawiyê were meşandin û civatek bindest û zalim û welatek ku ji kolonîzasyon û îstismarê dikişîne were rizgarkirin?

Û çend pirsên din ên bingehîn ku her çalakvanek, ne tenê siyasî lê di heman demê de sivîl, jîngehî, civakî û hwd.
jî, divê di çarçoveya kapasîteya xwe û li gorî qada xwe ya çalakvaniyê li bersivan bigere.

Bi gotineke din, divê armanc û mebestek me hebe, lê tewra bi armanca herî baş, herî bilind, herî hêja û herî rast jî, heke em ne xwediyê şiyana rêxistinkirin û rêberiya dînamîzmeke civakî ya armanc-navendî bin, ku di her ast û formê de kar bike, encamparêzî ji bilî depresyon û bêhêvîtiyê tiştekedin nade me.

Mixabin, bi salan e, em di du krîzên micid de ne: krîzeke epistemolojîk û krîzeke serokatiyê.

**Hewldana çareserkirina krîza epistemolojîk kareke giştî û pêvajoyeke guhertin û veguherînê ye, û beşek girîng a vê erkê ji bo çareserkirina wê dikeve ser milê hevalên me yên xwendewar, elît û çalakvanên meydanî û medyayê yên li welêt.**

Êş di “ferdî” de pênaseya xwe diafirîne. Ev pênase li ser bingeha meydanê ye û li ser ajan/ajanên di meydanê de disekine. Ji ber vê sedemê, erkê girîng ê “aktorên meydanê” tê tekez kirin.

Di mijara serokatiyê de, hem partî û hem jî kes û elît roleke girîng di çareserkirina wê de dilîzin, nemaze di têkiliya bi “seroktiya meydanê” de.

Dînamîzma ku di meydanê de heye, ne di astek bilind de bi xwestek û şiyanên cîhana virtual re yek e.

Yê ku kevir diguhezîne, ez ne keseke derveyî me, lê ew aktor/aktorên meydanê ne ku wate û çalakiyê didin tevgerê.


Dibe ku ev pirs were kirin ka gelo di vê dem û rewşa dijwar de, tevî gelek kêmasiyên wê, mimkun e ku ev her du krîzane di heman demê de werin çareserkirin?
An jî çareseriyek navîn û kurt-dem tune ye?

Bersiv erê ye. Bê guman, bi taktîk, pirs û çalakiyan, civak (bi taybetî çîna xwendewar, ku di vê dema dijwar de jî têr e) dikare bi awayeke epistemîk şok bibe (ber bi xemsarî û toleransê ve) û motîvasyona dermankirinê di rê û rêya tevgerê ber bi armanc/armancan (çalakiya kolektîf) de dikare di nav civakê de were xurt kirin.
Niha, tiştê ku divê di hiş û zimanê Kurdî de weke nirx, xêzek sor, yekîneyeke têkiliyê, pîvanek û bingehek bicîhkirî û rojane be “Kurdbûn” û “Kurdistan” e.

Û ev divê weke yekîneyeke ji bo hizirkirina li ser pêşerojê û amûrek ji bo her têkiliyek siyasî were hesibandin.

Bi hilbijartina vê rêyê ji bo çalakiyê û pêvajoyek ku li ser armanc/armancan disekine, em dikarin bi hişmendî li dû encamên pêşerojê biçin û, bê guman, di vê rêyê de, em dikarin ji kesên ku “sempatîzan” in û yên ku qala “êşa hevpar” dikin jî alîkariyê bixwazin.

Pirsa dawî dikare ev be, gelo me ji bo meşa di vê rêyê de gihîştine bi têgihîştineke hevpar?



## Nerîna



**“Xalid Ezîzî”:**

**“Xelkê Welatparêz ê Kurdistanê careke din ew rastî ji hemû cîhanê re ducare kir ku gelê Kurdistanê di xweşî û nexweşiyê he hevpar û hevxem û pişt û penahê hevin.”**



**“Mezlûm Ebdî”:**

**“Em hêvîdar in Remezan bo vegera awareyan bibe derfetek.”**



**“Maria Zakharovayê”:**

**“divê li Sûriyeyê berjewendiyên hemû pêkhateyan û bi taybetî yên Kurdan li ber çavan werin girtin.”**



**“Shelly Carlson” :**

**“Ez dixwazim li Amerîkayê bibim dengê Kurdan”**

# Zimanê Dayikê, Keleha Azadiyê: Ji Berxwedana Çandî heya Mafê Diyarkirina Çarenûsa Kurdistanê



N. Eskender Ceiferî

Di rojjimêra cîhanî de, Roja Zimanê Dayikê ne tenê bûyerek çandî ye. Ev roj girêdana kûr a di navbera ziman, nasname û rûmeta mirovan de bi bîr tîne. Wekî ku UNESCO tekez dike, pirrengiya zimanî mîrata hevpar a mirovahiyê ye, û parastina wê beşek ji parastina mafên bingehîn ên mirovan e. Lê ji bo hin neteweyan ji bo mînak ji bo Kurdan, ev roj ji dirûşmek çandî bêtir e. Roja Zimanê Dayikê roja berxwedanê ye li dijî înkar, asîmîlasyon û polîtîkayên kolonyalîstî yên demdirêj ku zimanê Kurdî kirine armanc da ku neteweya Kurd bêdeng bikin.

Li erdnîgariya Kurdistanê, ziman ne tenê amûrek ji bo pêwendîgirtinê ye, belku keleha yekem a parastina hebûna neteweyî ye. Di sedsalên dawî de, hikûmetên serdest hewl dane ku vê kelehê bi polîtîkayên asîmîlasyonê, qedexekirina perwerdehiya bi zimanê Kurdî, guhertina navên bajar, gund, kolan, çiya û her tiştê bi nasnameya Kurdî, û bi bêrêzîkirin bi çanda Kurdî, bişkînin. Ezmûna dîrokî ya Kurdan nîşan dide ku jiholêrakirina zimanê dayikê pêşmercek ji bo jiholêrakirina siyasî û aborî ye. Ji ber ku zimanek ku ji xwendingeh, ragihandin û rêveberiyê tê bêparkirin, hêdî hêdî ji bîra fermî û dû re jî ji mafê biryardana çarenûsa xwe tê dûrxistin.

Nêrîna dije faşîstî ya Kurdan tam ji vê ezmûna dîrokî derdikeve holê. Faşîzm, bi her şêweyî, li ser înkarkirina pirrengiyê û ferzkirina nasnameyek bilindtir hatiye avakirin. Dema ku dewlet an îdéolojiya serdest tenê zimanek û çîrokekê rewa dibîne, êdî mafê jiyanê yê nasnameyên din înkar dike. Li dijî vê mentiqê, parastina zimanê dayikê kiryarek dêmokratîk û dije faşîstî ye, ji ber ku ew li ser prênsîpa wekheviya çandî û mafê cudahiyê tekez dike.

Ji aliyekî din ve, mijara zimanê Kurdî nikare ji çarçoveya kolonyalîzma navxweyî ya li Rojhilata Navîn cuda were analîzkirin. Dabeşkirina axa Kurdistanê di navbera çend dewletan de piştî hilweşîna Împeratoriya Osmanî, bêyî ku vîna neteweya Kurd were hesibandin, desthilatdariyek dagirker çê kir ku tê de Kurd dikevin rewşek “piştguhxistî”. Di şert û mercên weha de, ziman bûye qada sereke ya pevçûnê. Li vir pirs derdikeve holê ka gelo neteweyek bê dewlet mafê wê heye ku zimanê xwe di qada giştî û fermî de bikar bîne? Bersiva dewletên serdest gelek caran neyînî bûye. Heke carna bersiv bi riwalet erênî be jî, li ser rûyê erdê berevajî vê hatiye selmandin.

Li vir girîngiya ramanên Franz Fanon xuya dibe. Di analîza xwe ya kolonyalîzmê de, Fanon dinivîse ku kolonyalîst ne tenê axê dagir dike, lê di heman demê de hiş û zimanê neteweya kolonîzekirî jî dagir dike. Li gorî baweriya wî, kolonyalîzm bi riswakirina zimanê gelê herêma kolonîzekirî û ferzkirina zimanê xwe, di mijara kolonîzekirî de cureyek xwe-xerîbbûnê diafirîne. Fanon tekez dike ku rizgariya netewî ne pêvajoyek tenê siyasî ye. Ew di heman demê de vegerandina rûmeta çandî û zimanî jî vedihewîne. Ger em vê analîzê li ser rewşa Kurdan bicîh bînin, em dibînin ku têkoşîna ji bo perwerde û naskirina zimanê Kurdî beşek ji têkoşîna rizgariya netewî ye.

Roja Zimanê Dayikê derfetek e ku ev girêdanê dîsa were zelalkirin. Di dehsalên dawî de, Kurdan bi avakirina dibistanên nefermî, weşandina pirtûk û ragihandinên bi zimanê Kurdî, û pêşxistina wêje û hunera hevçerx nîşan dane ku zimanê wan zindî ye. Lê jiyana çandî, bêyî garantiya mafên siyasî, her gav di bin gefê de ye. Heya ku mafê diyarkirina çarenûsê neyê naskirin, her destkeftiyek çandî dikare bi fermanek siyasî were sînordarkirin an qedexekirin.

Bi dîtina hiqûqa navnetewî, prênsîpa mafê diyarkirina çarenûsa neteweyan jî prênsîpek e ku di belgeyên Neteweyên Yekbûyî de hatiye naskirin. Ger neteweyek xwedî ziman, çand, dîrok û axek hevpar be, ew nabe ji mafê biryardana pêşeroja xwe bêpar bimîne. Xebat ji bo serxwebûna Kurdistanê, di vê çarçoveyê de, ne serpêhatiyek siyasî ye, lê hewldanek e ji bo garantîkirina domdar a mafên netewî. Mafên ku perwerde, rêveberiya Kurdistanê, pêşkeftina aborî û parastina nasnameya çandî dihewîne.

Rexnegirên serxwebûnê carina wê wekî gefek li ser aramiya herêmê dibînin. Lê ezmûnê daxuyandiye ku tepeserkirina nasnameyan û înkarkirina mafên netewî, sedemên sereke yên çêbûna pevçûnan in. Aramiya rastîn wê demê tê bidestxistin ku têkiliyên di navbera neteweyan de li ser bingeha wekhevî û




razîbûna hevbeş bin, ne li ser bingeha zorê û înkarkirinê. Serxwebûn, bi dîtina gelek çalakvanên Kurd, rêyek ji bo dûrketin û xweparastin ji çerxa domdar a zext û şermezariyê ye. Çerxek ku lêçûnên giran ên mirovî û aborî li ser milên hemî niştecihên herêmê ferz kiriye.

Di vê navberê de, zimanê dayikê rola histûna piştê ya vê projeya rizgarker dilîze. Zimanê ku helbest pê tê nivîsandin, dîrok pê tê vegotin û xewna azadiyê pê tê xuyakirin, ne tenê amûrek e. Ew, heman mal e ku neteweyek tê de xwe nas dike. Dema ku zarokek dikare bi zimanê xwe yê dayikê fêr bibe, bifikire û biafirîne, hestên wî yên pêşketin û baweriya wî bi xwe xurt dibin.

Berevajî vê, înkarkirina vî mafî valahiyek kûr di navbera nasnameya kesane û ya bi komî de diafirîne.

Ji bo Kurdan, Roja Zimanê Dayikê ji ber vê yekê bîranînek e ku têkoşînên çandî û siyasî ji hev nayên veqetandin. Mafê perwerdehiya bi zimanê Kurdî, çêkirin û parastina çapemeniya serbixwe ya Kurdî, û hewldana ji bo naskirina vî zimanî di hemû astên hikûmetê de gavên li ser rêya mezintir a rizgariya netewî ne. Wekî ku Fanon digot, bêyî ji nû ve avakirina çandî, rizgarî çê nabe û kêmasiyên wê hene. Çand jî, bêyî hêza siyasî lawaz dimîne.

Îro, di cîhanekê de ku ji her demê bêtir behsa pirrengî û pirçandîbûnê tê kirin, ceribandina rastîn a pirrengiyê, di qebûlkirina neteweyên wekî Kurdan de ye. Gelo civaka navnetewî amade ye ku li prênsîpên xwe yên wekhevî û mafê diyarkirina çarenûsê xwedî derkeve? An jî dê berjewendiyên jêopolîtîk, mafên neteweyan binpê bikin?

Bersivên van pirsan dê pêşeroja zimanê Kurdî û çarenûsa siyasî ya Kurdistanê diyar bikin. Lê tiştê ku diyar e ev e ku heya ku ziman bijî, xewna azadiyê jî dê bijî. Roja Zimanê Dayikê bîranînek e ji bo vê girêdana neşikestî di navbera peyv û azadiyê de; girêdanek ku tu siyasetek înkarker nikare bişkîne.

# Natiq: Felsefeya bingehîn a rejîmê li ser bingeha îdelojiya şer û hinartina şoreşa Îslamî bo derwe û xewin û xeyala rêberî kirina cîhana îslamî û dest gehîştun bi çekên etomî hatiye ava kirin. Li gor ezmûn û ceribînên berê û heya niha hatî xuya kirin ku armanca rejîmê ji wan danûstandinane tenê bo bi destxistina demê bûye û bi merema xwe rêkxistin kirin û gehîştin bi çekên navekî



Hevpeyvîn: Dara Natiq

Hevpeyvînkar: Sîmîn Rûhanîzadeh

**Hevpeyvîna taybet a rojnameya Agirî bi rêzdar Dara Natiq çalakvanê siyasî, li ser danûstandinên di navbera Amerîka û Îranê de hatiye encam dan.**

**Di demekê de ku rejîma Îranê hevdem digel danûstandinên xwe bi Amerîkayê re, serkut û tepeserkirin, îdam û girtina xwenîşanderam zêdetir dike, gelo ev danûstandin bi rastî dana derfetek din bi rêjîma Îranê nîne? herwisa derfetek din bi rêjîma Îranê bo bidestxistina rewatiya navdewletî nîne?**

Ez dikarim bêjim ku mixabim welatên ewrûpayî û bi taybetî Amrîka û hevpeymanên wê, pir caran û bi taybetî jî li xwenîşandanên wê dawiyê a gelên Îranê , car din îradeya azadîxwazî û mafxwaziya gelên Îranê kirin qorbaniyê meslehet û berjewendiyên xwe yên abûrî û weke hewce piştgîrî û harîkariya serhildan û bizava azadîxwazî li Îranê nekirin. Raste ew danûstandin û gotubêj bi Armrîkayê re weke derfetek e ji bo rejîmê ku bêhnwedanekî bike û xwe rêkxistin bike, lê ew yek jî êdî bi hewara rejîmê da nayê. Lê bi giştî dikarim bêjim ku mixabin Amrîka û ewrûpa hêşta bi avayekî micid û eşkere û piraktîkî pêngavên hewce ji bo guherîna rejîmê neawêtine û ew zêdetir siyaseta guherîna riftar û reformên di nava rejîmê de dişopînin. Ew dixwazin rejîmekî lawaz û qormîşkirî bi yasa û rêsayên navdewletî wek ya niha heyî bimîne û prisra mafên mirov û netewên bindest di îranê û rewşa aloz û nebaş a xelkên Îranê di ewlewiyeta siyaseta wan de ninne. Lê ew yek nikare bibe sebeb ji bo bêdeng kirin û fetisandina dengên azadîxwazî di îranê da. Rejîm êdî di wê rewşa niha de nikare bersivderê wîst û daxwaziyên xelkê bibe û bi hemî ew teperî û girtin û kuştina ku rêwe dibe jî dîsan şoreşa azadîxwazî û berxudan û mafxwaziya gelên îranê heya herifandina wê rejîme û avedankirina sîstemek demokratîk û federal yê berdewam bibe û her roj şîpel bide.

**Rejîm herdem dijminatiya bi Amerîkayê re wek amûreke prûpagandayê bi kar anîye, lê niha li pişt deriyên girtî bi wan re danûstandin dike. ev dijhevî, nîşana hilweşîna gotara îdeolojîk a Komara Îslamî û şikesta stratejîya rejîmê nîne?**

Siyaset û sitratêjiya rejîma axundî a Îranê her ji destpêkê we heya niha li ser bingeha direw û xapandina raya giştî û civatgeha navdewletî û xelkê belengaz e wî welatî hatiye ava kirin. Rejîm hem li nal dide û hem jî bizmar, ji aliyekî we bi çêkirina dujminên ferzî û siloganên dij bi Amrîka û Îsraêîlê dixwaze wisan bide nîşan ku ew rêberiya cîhana Îslamî dike û bala welatên îslamî û herêmî bo aliyên xwe bikişîne û ji aliyekî din we jî bi avayên nihênî û li binde di hewla razî kirina Amrîka û Îsraêîlê de ye û bi wan re danûstandin dikie û li hewla dirêj kirina deshilata xwe a dîktator de ye. Lê ew yek bi eşkere derdixe ku rejîm û felsefeya wê a sitratêjîk û îdolojîk bi tewahî li paradoksê de ye û li rastî û ya ku dibêjin dûr e. Armanca rejîmê ew e ku bi wê siyaseta han ewlehî û tenahiya herêmî têk bide û bi piştgîrî kirin ji girûpên terorîstî û tundajo û çêkirina aloziyan li welatên dedor bala raya giştî li ser rewşa xirab û aloz a îranê û meş û nerazîbûnên dij bi nîzamê li xwe dûr bixe û bi berdewamiya tepeserî û girtin û kuştina xelkên azadîxwaz û mafxwaz, hin din temenê biyom û dijî mirovîye xwe dirêjtir bike. rejîma Komara Îslamî ne tenê ji aliyê îdeolojîk ve bi teewahî hilweşaiye lê belkî di hemû warên leşkerî, îxbaratî, ewlehî û rêveberiya welatê de û bi xasmanî di warê abûrî û jîngeparêzî û …

bi tevahî hilweşiyaye. Girîngtir ji hemû wan jî ev e ku gel piştgirî jê nake.

**Di halekê de ku xelkê Îranê, li dijî rejîma Îranê rawestane û daxwaza wan nemana rejîmê ye, gelo balkişandina danûstandinan tenê li ser pirisa navkî cureyek ji piştguhavêtin a binpêkirina mafên mirovan û mafên siyasî yên xelkê nîne? Opozîsyon çawa dikare vê mijarê bike beşek ji destûrên karê cîhanî?**

Pirsa te girîng û stratejîk e, ji ber ku têkiliya di navbera siyaseta navneteweyî, mafên mirovan û berjewendiyên jêopolîtîk de pir caran têkildar û tevlîhev e. Di rewşekê de ku xelkek li dijî rejîmê radibin û daxwaza guherînê dikin, ger hêzên cîhanê danûstandinên xwe tenê li ser pirsa navkî bisînorkirin, ev dikare wekî nîşaneyek were dîtin ku berjewendiyên stratejîk li ser prensîbên normatîf têne pêşxistin.

Lê di siyasetê de pir caran welat û rêxistinên wekî Îran re di navbera du armancan de hewl didin balansê biparêzin:

1. astengkirina metirsiyên ewlehiyê (wekî belavbûna çekên nukleer),
2. parastina mafên mirovan.

Lê gelo ev piştguhavêtin e?

Ev girêdayî çavdêriya siyasî ye. Opozîsyon û aktorên civaka sivîl dikarin arguman bikin ku tenê li ser pirsa Navokî rawestan dibe sedema “normalîzekirina” rejîmê bê ku guh bidin daxwazên gel. Ev arguman di dîskursa mafên mirovan de bingehîn e û dikare li ser platformên navneteweyî bandor bike. Opozîsyon çawa dikare vê bike beşek ji ajandaya cîhanî?

Stratejiyên sereke ev in:

- Diplomasiya civaka sivîl: pêwendî bi parlementeran, partiyan û NGOyên cîhanî re.
- Belgekirina binpêkirinan: berhevkirina delîl û raporên qanûnî ku dikarin li dadgeh an forûman navneteweyî bêne bikaranîn.
- Çêkirina dîskursê: bikaranîna medyayê û torên civakî da ku pirsa mafên mirovan bi pirsa ewlehiyê re were girêdan.
- Koalîsyonên herêmî û cîhanî: hevaltî bi hereketên demokratîk ên welatên din re da ku pirs ne tenê wekî pirsgirêka navxweyî, lê wekî mijarek navneteweyî were dîtin.

**Ger dorpêç di encama danûstandinan de kêm bin, çi gerantîyek heye ku çavkaniyên aborî yên azadkirî tenê ji bo başkirina jiyana xelkê bêne bikaranîn, ne ji bo armancên din? Ezmûna Bercamê nîşan nadaye ku perê zêdetir, tepeserkirina zêdetir lipeyxwe tîne?**

Amrîka û welarên Ewrûpayê bi giştî û rêxistinên cîhanî bi taybetî di dema danûstandinan de û li hevhatina bi rejîma Axûndî re, pereyên bilok kirî yê rejîmê azad dikin û derfetên abûrî di asata navdewletî de ji bo Îranê bi armanca baştir kirina rewşa jiyana xelkê belengaze wî welatî diafirînin. Lê mixabin rejîm wî pereyî ji bo saportkirina girûpên terorîstî û têkdana ewlehiya herêmî û destwerdan di kar û barê welatên cîran û milîtarîze kirin û tepeserkirina welatiyan bikar tîne.

Di rêkewtina bercam de rastiya han zêdetir eşkere û dixuya ku rejîmê ne tenê ew pere ji bo avedanî û baştir kirina rewşa jiyana xelkê bikar neanî, belkî ew pere ji bo milîtarîze kirin û têkdana tenahiya herêmî û gef û îriş kirin ser cîhanê bikar anî. Hat xuya kirin ku rejîm bi tu avayekî pabendî yasa û rêsayên cîhanî nebû û zêdetir ji caran bo bi destxistina çekên navokî û şer û pevçûnên di asta herêmî û cîhanî de liv û tevger kirin û bû astengek mezin li hember dêmokratîze kirina herêmî de. Ji aliyekî din we jî dema ku hin derîmû derfetên abûrî ji aliyê cîhana pêşkewtîmwe bo Îranê dilivin, rejîm wê yekê weke derfetek bo tepeserî û serkûta zêdetir a xelkê azadîxwaz û nerazî di hundir de bikar tîne. Şepola îdam û eşkence kirinê zêdetir û maşîna tepeserî û girtin û zîndanîkirina xelkê zêdetir dibe.

**Bi nêrîna te ev danûstandin nîşana “rêforma rejîm”ê ye an tenê taktîkayek ji bo man û dem dirêj kirinê ye? di vê navberê de, rolê hêzên opozîsyon çi ye da ku bi cîhanê nîşan bidin, alternatîfa rastîn gel û tevgerên azadîxwaz in, ne danûstandin bi rejîma Îranê re?**

Bi salan e ku ew danûstandin di navbeta Îran û Amrîka û Rojava de birêve diçin û heya niha tu encamek wan tunebûye. Ji berku rejîm tu car bi niyetek rastîn û çareserkirinê têkilî wan danûstandinan nebûye. Siyaset û dîplomasiya rejîmû di asta navneteweyî de li ser bingeha direw û xapandina raya giştî hatiye ava kirin. Rejîm bi çi avayekî pabendî tu rêkewtinekî nebûye û esasen bawerî bi yasa û rêsayên civatgeha navdewletî tuneye. Felsefeya bingehîn a rejîmê li ser bingeha îdelojiya şer û hinartina şoreşa Îslamî bo derwe û xewin û xeyala rêberî kirina cîhana îslamî û dest gehîştun bi çekên etomî hatiye ava kirin. Li gor ezmûn û ceribînên berê û heya niha hatî xuya kirin ku armanca rejîmê ji wan danûstandinane tenê bo bi destxistina demê bûye û bi merema xwe rêkxistin kirin û gehîştin bi çekên navekî û ew naxwaze ku bi tu avayekî pirisgirêkên di navbera wan û Amrîka û cîhana derwe bên çareser kirin.

Lê hewceye ku hêzên opozisyon yên Îranî ku bawermend in bi aştî û azadî û çareserîya demokratî a gelên Îranê di çaroveya Îranekî demokratîk û federal de, bi yekrêzî û yekhelwestiya xwe û bi dîplomasîyek hewpar û mediyayek pşkewtî rastiya naveroka biyo a wê rejîma dîktator zêdetir bo raya giştî eşkere bikin û nehêlin ku ew car din cîhana pêşketî bixapîne.

# Welatparêzî: Pîvana Siyasî û Çandî ya Kurdistanê



N. Sefiye xalidî



Peyva welatparêzî ji Yûnaniya kevnar (patriṓtēs) û Latînî (patria) tê û di destpêkê de wateya "welatê bav û kalan" bû. Di seranserê dîrokê de, ew pêşketiye û bûye têgeha girêdanek erênî bi welatê xwe, çanda wê û nirxên wê re. Îro, welatparêzî bi gelemperî wekî evînek berpirsiyar ji bo welatê xwe tê fêmkirin û ji neteweperweriyê tê cudakirin.

Girîng e ku welatparêzî ji neteweperweriyê were cudakirin:
Welatparêzî = girêdana bi welatê xwe û berpirsiyariya li hember wê.
Neteweperwerî = rûmetdarkirina neteweya xwe, ku pir caran bi biçûkxistina yên din ve girêdayî ye.

Kurdistan herêmeke dîrokî û çandî ye ku nifûsa wê niha li ser çend dewletan belav bûye. Ji ber vê yekê, ji bo gelek Kurdan, welatparêzî ne tenê xwedî girîngiyeke sembolîk lê di heman demê de xwedî girîngiyeke hebûnî jî ye.

Rewşa axê ya heyî encama pêşketinên jeopolîtîk ên piştî Şerê Cîhanê yê Yekem e, bi taybetî Peymana Lozanê (1923), ku mafê çarenvîsî ya Kurdan nas nekir. Ji wê demê ve, bi mîlyonan Kurd wekî kêmnetewe li dewletên neteweyên cûda dijîn û pir caran di bin zextên siyasî, çandî an zimanî de ne û têne asîmîlekirin.

Li dewletên naskirî, welatparêzî bi gelemperî tê wateya dilsoziya ji dewletê re. Li Kurdistanê, welatparêzî roleke cuda û girîngtir dilîze: ew alîkariya mirovan dike ku nasnameya xwe ya hevpar biparêzin. Bi wî rengî, welatparêzî dibe hêzek girîng ji bo hevgirtina civakê û xweîfadekirinê.

Bêyî saziyên dewletê ku bi fermî ziman, dîrok û çandê biparêzin, hişmendiya welatparêzî roleke telafîker digire ser xwe. Wêje, muzîk, cilên gelêrî yên Kurdî û festîvalên mîna Nevrozê wekî wesîleyên nasnameyeke neteweyî tevdigerin ku bêyî naskirina dewletê berdewam dike. Li vir, welatparêzî bîra kolektîf xurt dike û rê li ber hilweşîna çandî digire.

Welatparêzî her wiha wekî hêzek ajotinê ji bo beşdariya siyasî tevdigere. Di rewşên ku xweseriya neteweyî pêk nayê, tevlêbûna welatparêzî dikare beşdarî rêxistinkirina tevgerên civaka sivîl, xwestekên ji bo xweseriyê, an destpêşxeriyên mafên mirovan bibe.

Welatparêzî ne hewce ye ku bi cudaxwaziyê re hevwate be, ew dikare daxwazên mafên federal an çandî di nav dewletên heyî de jî piştgirî bike.

**Stabilîzasyona psîkolojîk:**
Di vê çarçoveyê de, aramiya psîkososyal tê vê wateyê ku welatparêzî dikare hêza hundirîn bide mirovan. Hestê aîdiyetê bi taybetî ji bo nifûsên ku cudakarî, koçberî, an jî zordariya siyasî dîtine girîng e.

Hişyariya li ser eslê hevpar, ziman û dîrokek hevpar xwebaweriyê xurt dike û hêzê dide ku rewşên dijwar derbas bike. Ew hevgirtinê di nav civakê de pêş dixe û di navbera mirovan de hevgirtinê diafirîne.

Wekî din, ew nifşên pîr û ciwan bi hev ve girêdide ji ber ku kevneşopî, bîranîn û nirxên hevpar têne veguhastin. Ev yek berdewamî û hestek aramiyê diafirîne, tewra di demên ne diyar de jî.

**Welatparêzî: Rewabûn û Dijwarî**
Di heman demê de, welatparêzî ne têgehek bê pirsgirêk e. Ew dikare bandorek yekgirtî hebe, lê di heman demê de xetereyan jî hildigire:

Aliyê erênî: Pêşvebirina hevgirtinê, xwerêzgirtina çandî û beşdariya siyasî.

Aliyê neyînî: Xetera radîkalîzasyonê, dûrxistina komên din, an jî polarîzasyona etnîkî.

Ji ber vê yekê, di neteweyên nehatine naskirin de, pirsa girîng ev e ku welatparêzî çawa tê pênasekirin: wekî têgehek nasnameya demokratîk û berfireh an jî wekî îdeolojiyek etnîkî ya taybet.

**Pîvana navneteweyî:**
Pirsa Kurd ne tenê herêmê bi xwe eleqedar dike, lê di heman demê de girîngiya wê ya navneteweyî û yasayî jî heye. Li gorî qanûna navneteweyî, ku di Peymana Neteweyên Yekbûyî de hatiye destnîşankirin, hemû gel xwedî mafê diyarkirina çarenûsa xwe ne, anku, biryardana pêşeroja xwe ya siyasî.

Lêbelê, ev maf pir caran bi yekparçeyiya axa dewletên heyî re nakok e. Welatên ku Kurd lê dijîn – wek Tirkiye, Iraq, Îran û Sûriye – sînorên xwe neguherbar dibînin. Ev yek di navbera xwesteka Kurdan a diyarkirina mafê çarenûsê û berjewendiyên dewletên ku dixwazin axa xwe biparêzin de tengezariyekê diafirîne.
Di vê çarçoveyê de, welatparêzî li Kurdistanê ji evîna tenê ji bo axê bêtir e. Ew wekî amûrek ji bo parastina nasnameya çandî û neteweyî xizmet dike, di heman demê de rastiya siyasî tevlihev e. Bi wî rengî welatparêziya Kurd di navbera xurtkirina nasnameyê ya rewa û pirsgirêkên jeopolîtîk ên ku ji dînamîkên hêzê yên navneteweyî û herêmî derdikevin de digere.

Welatparêzî di nava neteweyên nehatine naskirin de wekî Kurdistanê xwedî girîngiyeke taybet e. Ew wekî hêzek nasnameçêker, parastina çandî û seferberkirina siyasî tevdigere. Her çend di dewletên damezrandî de welatparêzî pir caran bi dewletê ve girêdayî be jî, li vir ew amûrek ji bo xwe-îspatkirina kolektîf temsîl dike.

Lêbelê, forma wê girîng e: Welatparêziyeke demokratîk û piralî dikare beşdarî îstîqrar û pêşkeftina siyasî ya avaker bibe, lê neteweperweriyeke taybet dikare nakokiyan girantir bike.

Ji ber vê yekê, di çarçoveya Kurdistanê de, welatparêzî ne tenê daxuyaniyek siyasî ye, belku bêtir îfadeya têkoşîneke berdewam ji bo naskirina çandî, mafên siyasî û edaleta dîrokî ye.

# Kempeyna "Zimanê min, nasnameya min e"
## Bangewaz

Em roja 21ê sibatê ku wek roja cîhanî ya zimanê dayikê hatiye binavkirin, dikin derfetek ji bo berevanîkirin ji zimanê xwe yê neteweyî (zimanê kurdî) û bi organîzekirina kempeynekê hewla parastin û vegeşandina vî zimanî didin.

Herçend li jêr siya zêdetir ji sedsalekê xebat û tekoşîna neteweya Kurd di beşek ji nîştimana Kurdistanê (Herêma Başûrê Kurdistanê) de, eva çend dehikek e ku xwendin û nivîsîna zimanê kurdî wekî yek ji zimanên fermî yên dewleta federal a Îraqê û Hikûmeta Herêma Kurdistanê azad e, û bi dehan navendên akademî li piştê ne, lê mixabin di beşên din ên Kurdistanê û yek ji wan Rojhilatê Kurdistanê de, zimanê me heya niha jî her qedexe ye.




Serbarê astengiyên li ser rêya xwendin û nivîsîna bi zimanê kurdî û fermînenasîna vî zimanî li Rojhilatê Kurdistanê, û berdewamiya siyaseta serkut û înkarê di herdu rejîmên Pehlewî û Komara Îslamî de, lê dîsan jî bi hewl û tekoşîn û fidakariya nivîskar û helbestvan û wêjevan û navendên fêrkariyê yên zimanê kurdî û navendên din ên çandî li Kurdistanê, zimanê kurdî li Rojhilatê Kurdistanê ne tenê metirsiya tunebûn û lawazbûnê li ser wê vereviyaye, belku rêya vegeşînê jî girtiye pêşiya xwe.

Lewra wekî Navenda Rêkxirawên Medenî yên Rojhilatê Kurdistanê, bi hemşêviriya digel komek ji kesayetî û rêkxistinên taybet bi vî warî li navxwe û li derveyî welêt, me îsal bi armanca hewldaneke zêdetir ji bo parastina zimanê kurdî, û herwiha rêzgirtin ji hewl û tekoşîna dehan salî ya parêzerên zimanê kurdî li bereberê roja cîhanî ya zimanê dayikê, kempeynek bi diruşma "Zimanê min, nasnameya min e" dest pê kiriye.

Di vê derheqê de em rû li civaka çandî û kulturî ya Kurdistanê, çalakên medenî û rêkxistinên civaka medenî, partî û rêkxistinên siyasî yên Kurdistanê, mamostayên welatparêz yên olî û xwendingehan, xwendekaran û dersxwanan, ciwanan û dayikan û hemû komên xelkê Kurdistanê، em daxwaz dikin ku bi hemû hêz û shiyana xwe piştevanê vê kempeynê bin û tê de beşdar bin.

Her di vê derheqê de em daxwazê li hemû takên civaka Kurdistanê dikin، ku di van çend rojan de -heya roja 2ê reşeme- bi xwendin û nivîsîna helbestan an jî her deqeke ciwan a kurdî û belavkirina wê di torên civakî de، û herwiha bi birêvebirina kom û civînên curbicur û afirandinan، di vê kempeynê de beşdar bin.

Hûn bi beşdariya xwe di kempeyna "Zimanê min, nasnameya min e" de، erkeke neteweyî ji bo parastina nasnameya me ya kurdî bi rê ve dibin، û bi afirandinên ciwan û pir wate yên xwe، hûn kempeynê dixemilînin û peyameke têr û tejî digihînin guhê neyarên ziman û nasnameya me ya neteweyî.

**Pîroz be roja zimanê dayikê**
**Vegeşe zimanê şirîn ê kurdî**
**Navenda Rêkxirawên Medenî yên Rojhilatê Kurdistanê**

**12-02-2026**

# Di şîna seydayê mezin M. Emin Bozarslan de



N. Dr Mecîd Heqî

Bavê perwerdehiya zimanê Kurdî ya nûjen li Bakura Kurdistanê

Îro, ziman û wêjaya Kurdî yek ji stûnên xwe yên bêdeng ên herî domdar winda kir.

Mihemed Emîn Bozerselan (1935 – 09.202026), nivîskar, lêkolîner, mamoste û yek ji pêşengên herî wêrek ên perwerdehiya zimanê Kurdî, koça dawî kir, lê tiştê ku ji wî maye ne tenê berhevokek pirtûkan e, lê rêyek dîrokî ye ku miletek nêzîkî xwendin, nivîsandin û «xwebûn»ê kir.

Ew ji nifşekê bû ku axiftin û nivîsandina bi zimanê dayikê ne wekî hilbijartinek çandî, lê wekî kiryarek siyasî û biha dihat hesibandin. Di cîhanekê de ku zimanê Kurdî li Bakurê Kurdistanê wekî sûc dihat dihat dîtin, Bozarslan biryar da ku tiştekê bike ku hêsan xuya dikir, lê bingehên înkarê hejand: fêrkirina alfabeyê ji gelê xwe re.

**Alfabe; Pirtûkek Biçûk bi Sûcek Mezin**

Di sala 1968an de, dema ku pirtûka «ALFABE» hate weşandin, tenê 64 rûpel hebûn; Lê ji bo hikûmeta Tirkiyê, ev 64 rûpel wekî «hewldanek ji bo parçekirina welêt» hat hesibandin.

Ji bo Bozarslan, «Alfabe» ne daxuyaniyek siyasî bû û ne jî manîfestoyek îdeolojîk bû; ew bersivek mirovî bû ji bo pêdiviyek hêsan:

Mirovên ku bi Kurdî diaxivin mafê wan heye ku bi Kurdî bixwînin û binivîsin.

Lê vê sadehiyê ew xist zindanê. Girtin, darizandinên dirêj, salên darizandinê û qedexekirina daîmî ya pirtûkê bedela nivîsandina bi zimanê xwe yê zikmakî bû. «Alfabe» bû yekane pirtûka alfabeyê li cîhanê ku hate qedexekirin; û ev yek ew kir sembolek dîrokî.

**Penaberî, lê ne bêdengî**

Koçberiya bi zorê ya Swêdê di sala 1978an de ne dawiya rê bû. Li Uppsala, Bozarslan xebata ku wî li Amedê dest pê kiribû domand:

nivîsandin, hînkirin û ji nû ve avakirina bîra çandî ya Kurdan.

Wî ne tenê çapên paşê yên «Alfabe» çap kirin, lê di heman demê de bi dehan berhem di warên wêjeya zarokan, folklor, çîrokên kurt û rastkirinên nivîsên klasîk ên Kurdî de li pey xwe hiştin. Wergerandina berhemên girîng ên wekî Mem û Zîn a seyîda Ehmedê Xanî ji tîpên aramî bo latînî ne tiştek bû ku zimannasek bi tenê dikare bike; ew projeyek şaristanî û netewî bû ji bo nasîna manîfista netewiya gelê Kurd.

**Rewşenbîrek bê jest**

Buzerselan ne ji wan rewşenbîran bû ku xwe di pişt peyvan de vedişêre. Zimanê wî sade bû, lê projeya wî mezin bû. Ne slogan çêdikir, ne jî xwe di navenda balê de digirt. Xebata wî, aram û berdewam, avakerê nifşan bû. Zarokên ku bi pirtûkên wî fêrî xwendinê bûn, îro mamoste, nivîskar û lêkolînerên zimanê Kurdî ne.

Wî bawer dikir ku jiyan bi perwerdehiyê tê, berî siyasetê.



**Xatirxwestin ji mamosteyê neteweyekê re**

Îro, seyda Mihemed Emîn Buzarselan koça dawî kir, lê alfabeya ku wî nivîsandiye hîn jî tê xwendin.

Di cîhanek ku hêz tên û diçin de, tiştê ku dimîne ew tîp in ku mirov navên xwe pê dinivîsin.

Ew çû,

Lê her zarokek ku bi Kurdî dixwîne,

Her pirtûkek ku bi Kurdî hatiye weşandin,

Her mamosteyek ku bê tirs zimanê dayikê fêr dike,

berdewamiya rêya wî ne.

Bîranîna wî bi qedir e, û navê wî di dîroka çandî ya Kurdistanê de nemir e.


# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Rêjîma Îranê, bi kom û bi awayê online sizaya bidarvekirinê bi ser girtiyan de disepîne

Pêka rapora "EURO NEWS"ê dadverê reşnav ê rêjîmê Ebulqasim Selewatî, serokê taya 15 a dadgeha inqilab a rêjîmê, li kombûnên online de sizaya bidarvekirinê bi ser 14 neraziyên binçavkirî de sepandiye.

Hatiye baskirin ku dadgehîkirinê wiha lezgîn û sepandina bi lez a bidarvekirinê bi ser neraziyên binçavkirî, bi awayê online û li girûpên 14 kesî yên girtiyan bi rê ve diçin û sizaya bidarvekirinê bi kom bo ser wan de tê sepandin.

Pêka vê raporê, hejmareke ji wan girtiyan, bi birîndarî hatine îşkencekirin û ti pêregihîştineke pizîşkî jî bo wan nehatiye kirin û li jêr hovanetirîn îşkenceyan de îtirafkirinên bi zorê bi wan dane wajokirin.




## Rêjîma Îranê bi hêzeke zêde û bi tundûtîjuyek hovane êrîşkirie ser gundê Çinarê

Pêka dawî raporên belavbûyî, demjimêr 4ê sibêdeha roja Duşemî 16ê Şibatê, hêzên ewlehî yên rêjîma Îranê bi karwaneke 70 maşînan ku ji maşînên zirêpoş, wen, minbos û maşênên serbazî ku çekên doşkeyan li ser danîbûn, êrîş kirine ser gundê Çinarê ser bi devera Şêx Esedabad a bajarê Hemedanê û bi awayekî hovane, xelkê wî gundî ji zarok û jinan ve heta kal û bi temen ve bi tundûtîjiyek hovane kutan û zêdetir ji 400 kes ji wan jin û zarok û kal û bi temenan, binçav kirine.

Pêka wan raporan, karbidestên rêjîmê hejmareke zêde ji wan jin û zarokan piştî kutaneke nemirovane li qefesan xistine û piştî gerandin li nav gund de bo binkeya kelanteriya rêjîmê veguhastine.

Înterneta gundê Çinar a Şêx Esedabad ku yek ji navendên destpêkirin a serhildana li befranbara îsal de bû, hatiye qutkirin û rêyên hatinûçonê li jêr kontrola tund a hêzên ewlehiya rêjîmê de ne û canê xelkê vê deverê bi micidî li jêr gefan de ye.



## Rêjîma Îranê zêdetir ji 13 girtiyên din jî bidar vekirin

Pêka rapora "HRANA"yê, sibêdeha roja Pêncşemî 12ê Şinatê, rêjîma Îranê zêdetir ji 13 girtî li girtîgehên xwe li seranserî Îranê de bidar vekirine ku navê 13 kes ji wan hatine tomar kirin ku bi vî awayî ne:

"Areş Dawerî li girtîgeha rêjîmê li bajarê Bûşêhrê, Seîd Adîne li girtîgeha rêjîmê li bajarê Şehrê Kurd, Kêyhan Rozî li girtîgeha rêjîmê li bajarê Îsferayinê, Kiyraş Leşkerî li girtîgeha rêjîmê li bajarê Bokanê, Emîrhusên Qedemî li girtîgeha rêjîmê li bajarêBêhbehanê, Axpûr ku navê vê nehatiye zanîn li girtîgeha rêjîmê li bajarê Bucnûrdê, Pencelî Îbrahîmî li girtîgeha rêjîmê li bajarê Mahşehrê, Pêyman Xanî li girtîgeha rêjîmê li bajarê Firdosê, Riza Beyatî li girtîgeha rêjîmê li bajarê Kaşmerê, Hesen Komrêyî li girtîgeha rêjîmê li bajarê Gunabadê, Kerîn Gerayî li girtîgeha rêjîmê li bajarê Taybadê û Mihemedriza Ebdullahî li girtîgeha rêjîmê li bajarê Sariyê" hatine bidarvekirin.



# Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (512)

